

ŞÊX MUŞERREFÊ XÎNÛKÎ Û KESAYETA WÎ YA EDEBÎ

Nesim SÖNMEZ

Beşa Ziman û Çanda Kurdî- Enstîtuta Zimanên Zindî- Zanîngeha Wan Yüzüncü
Yilê/Turkiya

PUXTE:

Şêx Muşerrefê Xînûkî di sala 1926an da li bajarê Sêrtê li navçeya Berwarîyê li gundê Xînûkê ji dayîka xwe dibe. Di zaroktîya xwe da di medresa bavê xwe da bi hînbûna Qurana Pîroz dest bi xwendina xwe dike. Paşê di gelek medreseyan da dixwîne û îcazeta xwe digire. Piştî wergirtina îcazetê vedigere gundê xwe, hem dest bi melatîyê hem jî seydatîyê dike, ew di medresa xwe da gelek feqîyan perwerde dike, wan dixê rêya dînê Îslamê û miletê xwe. Ew ji ber hinek sedemên siyasî ji bakûr derbasî başûr dibe û bi qederê du salan li Zaxoyê disekine. Di heman deme da diçe Hewlêrê û bi Şêx Kemalettînê Erbîlî ra hevnasîyê datîne û dikeve terîqeta wî û dibe xelîfê wî. Xînûkî di sala 2008an da emrê Xwedê bi cih tîne û wefat dike.

Temenê Xînûkî di qada xwendin û nivîsandinê da derbas dibe û wî li pey xwe gelek berhemên payebilind hiştine û ew berhem diyarîyî qada zanistîyê û miletê xwe kirine. Şêx Muşerrefê Xînûkî ne zimanê kurdî tenê zimanê erebî, farsî û tirkî jî bi têra xwe zanîbûye. Mirov dema berê xwe dide berhemên wî vê agahîyê bi awayekî zelal dibîne. Xînûkî kesayetek miletperwer û kurdîhez e. Ew di derheqê parastina zimanê kurdî da xemxar e, lewra wî berhemên xwe bi piranî bi zimanê kurdî nivîsandîye. Ji berhemên wî ya herî girîng dîwana wî ye. Xînûkî dîwana xwe bi çar zimanî yanê bi kurdî, erebî, farsî û tirkî nivîsandîye.

Di vê teblîxê da emê jiyan, berhem û kesayeta edebî ya Şêx Muşerrefê Xînûkî bi hûrgulî bidin nasîn û bi taybetî jî li ser dîwana wî bisekinin û binirxînin.

Peyvên Serekî: *Şêx Muşerrefê Xînûkî, Dîwan, Sêrt, Berwarî, Medrese*

DESTPÊK

Rewşa Medreseyên Herêma

Medrese, peyveke ‘Erebî ye û ji lêkera “de-re-se” yê hatiye dariştin û tê wateya cihên ku têda ders tên dayîn⁽¹⁾. Bingeha medreseyê bi teqez kengê destpê kiriye hetanî vê gavê diyar nebûye, lê mirov dikare bibêje bingeha medreseyê xwe digîhîne serdema destpêkirina dînê Îslamê. Bi awayekî rêkûpêk cara yekem di serdema Dewleta Selçûqîyan da li Bexdayê ji aliyê Nîzamu’l-Mulk va Medreseya Nîzamiyeyê

(1066–1067) tê avakirin û têda perwerde destpê dike⁽²⁾. Medreseyên ku di herêmen Kurdan da hatine avakirin, binyada xwe ji serdema destpêkirina Îslamê va digirin.

Di medreseyên Kurdan da zimanê perwerdehiyê zimanê Kurdî bû. Ew kitêbên ku di medreseyên Kurdan da dihatin xwendin piraniya wan bi Erebi, hinekên wan jî bi Kurdî bûn, lê xwendin û şrovekirina dersan ji sedî sed bi Kurdî bû. Seyda, kitêb bi Kurdî ji feqiyan ra şrove dikirin û feqiyan jî bi Kurdî dixwendin û dersên xwe ji seydayên xwe ra vedigotin. Şêx Muşerref jî di medreseyan da bi Kurdî xwendiyê û bi Kurdî ders daye.

Mirov dema berê xwe dide rewşa medreseyên herêma Kurdan dibîne ku medrese di nava sê merheleyan da derbas bûne û ev merhele jî ji evxalên jêrê ne:

- ✓ Medrese bi alîkariya rêveberên mîrektîyên kurdan, xizmeta perwerdehiyê berdewam kirine.
- ✓ Alîkariya rêveberên dewletê ji bona medreseyan roj bi roj kêmtir bûye.
- ✓ Alîkariya rêveberên dewletê bi temamî xilas bûye û medrese hatine qedexekirin⁽³⁾.

Dema ku medrese azad bûne û bi alîkariya rêveberên mîrektîyên Kurdan derketine, berhemên giranbûha diyarî dinyayê û Kurdan kirine. Bo nimûne; Îbn’l-Esîr (1160-1233) û Îbn’l-Îz Îsamîl Îbn Rezzaz el-Cezerî (?- 1206) ji van kesan in.

Medreseyên herêmê bi alîkariya rêveberên mîrektîyên Kurdan xebatên xwe berdewam kirine. Lê belê dema ku dever dikeve bin destê Dewleta Osmaniyan, karûbarên perwerdehiyê ji aliyê hikûmeta navendî va têtê domandin û bi piranî deverên ku nêzîkî paytext bûne, wan zêdetir alîkarî ji hikûmetê girtine. Bo nimûne herêmen Rojava û Anatolyaya Navîn para herî mezin girtine. Ji aliyê din va di serdema Osmaniyan da ew kesên ku li herêmê desthilatdar bûne wan jî ji bo medreseyan û perwerdehiyê, alîkariyên xwe roj bi roj kêmtir kirine. Ji ber van sedeman medreseyan êdî, hêdî hêdî xwe ji bajaran vekişandine û berê xwe dane gundan. Mirov ji ber van sedeman ji bona vê serdemê jî dikare bibêje serdema paşdamayîna medreseyan⁽⁴⁾.

Li Tirkîyeyê, piştî îlankirina Cumhûriyetê di warê perwerdehiyê da gelek gavên hişk têne avêtin. Dev ji fikra azîneya rojhilatîyê têtê berdan û azîneya rojavayîyan têtê pejirandin. Mirov dikare bibêje dev ji fikr û ramana dîndariyê têtê berdan û azîneye laîk û netewetî têtê pejirandin. 3yê Adara 1924an da qanûnek bi navê “Tevhid-i Tedrisat/Yekserkirina Perwerdehiyê” têtê derxistin û bi vê qanûnê Şer’iyye û Ewqaf Wekaletî/Wezareta Karûbarê Dîn û Weqfan û medreseyên têda perwerde dihatine kirin, têne girtin. Sedema girtina medreseyan ew bûye ku rêvebirên Cumhûriyetê digotin perwerdehiya di medreseyan da perwerdehiyeke dînî ye û li dijî fikra rojavayî û Laîsîzmê ye. Wezareteke bi navê Wezareta Perwerdehiya Neteweyî têtê sazîkirin û bi tevahî sazîyên perwerdehiyê bi vê wezarete û têne girêdan.

Bi derxistina qanûna “Tewhid-i Tedrisat”ê û bi awayekî fermî girtin û qedexekirina medreseyan li herêma Kurdan zirareke mezin dide pergala perwerdehiyê. Li bajarê Sêrtê xwendina di medreseyan da gelek pêş ketibû û li her deverê belav bibû. Bi vê qanûnê çawa ku herêm zirarê dibîne, were jî bajarê Sêrtê zirarê dibîne. Hikûmeta Enqereyê, bi şiklekî taybet, medreseyên vî bajarî dişopîne û

mufetişên ku ji aliyê Enqereyê va hatibûn wezîfedarkirin, bi raporên xwe herdem wan agahdar dikin. Lê belê her çiqas ev zor û zehmetî hebûn jî perwerdehiya di medreseyan da bi temamî xelas nebû. Hinek medreseyan guhertin di nav xwe da çêkirin û karên xwe berdewam kirin û hinekê wan jî li ser formata berê perwerdehiya xwe domandin⁽⁵⁾. Mirov dikare bibêje ev merheleya hanê jî merheleya sisêyan bû ji bona medreseyên Kurdistan.

Êdî medrese nikarîbûn pergala xwe taze bikirana û di warê ilm û zanistê da tiştên di dinyayê da diqewimîn kêr xebere wan jê çêdibûn. Medrese êdî bi tenê mabûn cihê serf û nehwa zimanê Erebbî yanê ilmên fennî nedihatîn xwendin. Ev jî ji aliyê perwerdehiyê va bû sedema paşdemayîna Kurdistanê.

Ev guhertinên ku ji aliyên hukûmeta Enqereyê va di aliyê perwerdehiyê da têne çêkirin, di derbareyî medreseyan da, li ser gelê herêmê û Sêrtê tesîreke neyînî çênake; berevajî hezkirina medreseyan her diçe zêdetir dibe. Medreseyan di nav van zor û zextên dijwar da bi hezkirin û alîkariya gel karûbarên xwe hinek caran bi dizî û hinek caran jî bi aşkere berdewam kirine. Bi qasî ku me tespît kiriye, îro halê hazir li Sêrtê 9-10 medrese perwerdehiya xwe berdewam dikin. Ji van medreseyan her yekê bi şiklekî fermiyet bi dest xistiye û karûbarên xwe didomîne. Sazgehên ku ji bona perwerdehiyê bi terza rojavayê û bi azîneya laîk hatin avakirin, ji hêla gel va zû zû nehatine qebûlkirin û rexbetêke biqîmet nedîtine. Ev nêrîna hanê gelek salan berdewam kiriye û zirareke mezin daye zarokên Kurdistan. Lewra ew zarokên diçûn medreseyan dixwendin û ji seydayên xwe îcazet distandin û diketin qada kar û xebatê, didîtin ku ew îcazeta di destê wan da li cem dewletê tu wateyakî wê tune ye. Êdî gel van salên dawiyê zarokên xwe hindik dişînin medreseyan ji bo ku di warê fermiyetê da tu qîmetek ji bona wan nemaye. Ev yek jî li gelek deveran bû sedema girtina medreseyan. Helbestvan û rewşenbîrên mijara me Şêx Muşerref jî yek ji wan kesan e ku di bin şert û mercên evqas giran da di medreseyan da xwendiyê û bûye yek ji seyda û alimê herêmê.

1. JIYANA ŞÊX MUŞERREFÊ XINÛKÎ

1.1. Navê Wî û Malbata Wî

Şêx Muşerrefê Xinûkî, di sala 1926an da li bajarê Sêrtê li navçeya Xesxêrê/Berwarî (Pervarî) li gundê Xinûkê (Güleçler) tê dinê. Dayîka wî, navê wî lê dike Muşerref. Navê bavê wî Şêx Es'edê Sanî (duduyan) ye, ew jî kurê Şêx Ebdullah, ew jî kurê Şêx Es'edê Ewwel (

Şêx Muşerref, li cem bavê xwe Şêx Es'edê Sanî dest bi xwendina xwe dike. Li gorî medreseyên Kurdistan piştî xitimkirina Quranê, Mewlûda Melayê Bateyî, Nûbihara Piçûkan ya Şêx Ehmedê Xanî û Nehcu'l-Enama Mela Xelîlê Sêrtî ya bi Kurdî, dest bi kitêba bi navê 'Izziyeyê dike û li cem bavê xwe hetanî digêhêje kitêba bi navê Camiyyê dixwîne. Lê di vê navberê da hinek caran li cem seydayê Mela Ebdullahê Saruhî jî dixwîne û paşê diçe gundê 'Eynikê û ev gund girêdayî bi navçeya Misirci/Gurdilanê (Kurtalanê) ye, li cem seydayê Mela Teyyîbî, ku ji malbata seydayê Mela Xelîlê Sêrtî ye, dixwîne.

Di 16 saliya xwe da diçe gundê Helenzeyê, di medreseya Mela Ebdulhekîmê Helenzî da xwendina xwe berdewam dike. Mela Ebdulhekîmê Helenzî, kurê Mela Hesenî ye, ew jî kurê Mela Mustefa ye, ew jî kurê Mela Xelîlê Sêrtî ye. Helenze, gundek girêdayî bi Sêrtê va bûye û aniha jî bûye taxek ji taxên bajêr û bi Tirkî jê ra dibêjin Bağtepe. Şêx Muşerref û birayê xwe Şêx Munewwer û kurmetê xwe Mela Tahayê Saruhî, bi hev ra di sala 1942an da têne Helenzeyê û li cem Mela Ebdulhekîmê Helenzî dibine feqî û wê demê Mela Bedreddînê Tilloyî jî li wê derê feqî bûye.

Şêx Muşerref, hinek dersên cem'û'l-cewamî'ê li cem Şêx Mustefayê Hemzewî dixwîne. Şêx Mustefayê Hemzewî jî Seyidê Hemzewiyan e û ji Şêx Hemze el- Kebîr Tilloyî hatiye nîsbetkirin.

Şêx Muşerref, xwendina xwe ya dawî, hinekî li cem seydayê Mela Ebdulhekîmî û hinekî jî li cem bavê xwe Şêx Es'edî xwendiyê û ji herduyan jî icazet wergirtiye.

Şêx, kitêbên rêzê yên ku di medreseyan Kurda da têne xwendin, bi temamî bi dersinî neqedandine, lê seydayên wî gotinê ku tu mutale'eyê bike bes e û êdî nehewceye tu bi awayê dersxwendinê van kitêban bixwînî û îcazeta wî danê.

Şêx Muşerref du caran zewiciye. Jina wî ya ewil; keça Şêx Muhemmed Salihê Arvasî û neviyê Şêx Fehmî Arvasî, Safiye Xanim e. Şêx Muşerref kurê xwarziya Şêx Muhemmed Salihê Arvasî ye; yanê Safiye Xanim keça xalê wî tê hesibandin. Daweta wan di sala 1946an da dibe û ji vê zewaca wan Xwedê bi navê Muhemmed Nazim û Muhemmed Asim du kur û keçek bi navê Cennetî Xanim danê.

Şêx Muşerref di sala 1961î da cara duduyan dizewice û keça Mela Xelîlê Tillowî Ebbasî jî malbata Feqîrullah tîne. Ji vê zewacê jî bi navê Muhemmed Şîfa, Muhemmed Wefa, Ebdullah, Muhemmed Seîd û Muhemmed Samî pênc kur û pênc keç dibin.

Ew, piştî qedandina xwendina xwe û zewaca xwe bi qederê 3-4 salan firar dike û ji Sêrtê derdikeve, diçe Başûrê Kurdistanê li gundekî bajarê Zaxoyê bi navê Berzûran bi cih dibe. Sedema çûyîna wî ya Başûrê Kurdistanê herî baş Xwedê.

Lê ev xerîbiya wî zêde berdewam nake; ji ber ku xerîbî jiyaneke bi zor û zehmet e, ew jî him bêriya dayîk û bavên xwe dike, him jî bêriya dost û yarên xwe dike. Bavê wî Şêx Esedê Sanî, diçe deşta Silopiya û çend kesan dişîne pey wî û ew jî him naxwaze bavê xwe bişkêne û him jî zêde bêriya dost û hevalên xwe weke Mela Bedreddîn dike û vedigere war û welatê xwe.

Şêx Muşerref, piştî ku leşkeriya xwe diqedîne, li Berwariyê li gundê Rubarê (Yeniaydin) dest bi melatîyê dike. Li vî gundî medreseyekê vedike û têda dest bi dersdayîna feqîyan dike. Şêx, li Rubarê di navbera dîroka 1953-1977an da melatî û seydatîyê dike. Bavê wî, Şêx Esedê Sanî, li gundê Xinûkê karûbarên îrşada miletî dikir û di sala 1967an da wefat dike û li dewsa wî kurê wî, Şêx Munewwer rûdine û karê bavê xwe berdewam dike û di sala 1977an da ew jî wefat dike. Piştî wefata birayê wî Şêx Munewwer, ew ji gundê Rubarê vedigere gundê xwe Xinûkê û li wir di şûna bavê xwe da, dest bi melatî û seydatîyê dike û hetanî diçe ber rihma Xwedê li gundê xwe jiyana xwe ya mayî didomîne.

Şêx Muşerref, ji ehlê terîqeta Neqşebendiyan ji şaxa Xalidiyan e û peyrewê Şêx Mustefa Kemaleddînê Erbîlî ye. Li vê derê em dixwazin bi kurtasî behsa tesewufê û terîqeta Neqşebendiyan bikin.

Tesewuf, peyveke 'Erebî ye û koka xwe ji lêkera "şe-we-fe"yê digire û tê wateya lixwekirina cilûbergên hîrî⁽⁶⁾. Weke têgeh jî tê wateya di navbera Xwedê û evdê wî da pêkhatina bûyera ihsanê⁽⁷⁾.

Fikra tesewufê, ew fikre ku di reseniya xwe da 'eşqa Xwedê di xwe da dihevine û tetbîqkirina ew esasên bingeîn yên ku ji Adem Pêxember hetanî Hezretî Muhammed bi tevahî pêxemberan anîne û dîrketina ji hemû rengên şîrk û kufrê ye⁽⁸⁾.

Armanca me li vir ne ew e ku em dîr û dirêj qala mijara tesewufê bikin. Ji ber ku Şêx Muşerref neqşebendî ye me xwest em bi kurtasî behsa terîqeta Neqşebendîtiyê, Mewlana Xalidê Şehrezorî û Şêx Mustefa Kemaleddînê Erbîlî bikin. Ka gelo Şêx Muşerref çawa bûye peyrewê vê terîqetê.

Terîqeta Neqşebendiyan, navê terîqeta ku ji aliyê Bahauddîn Muhammed el-Buxarî (1318-1389) va hatiye sazîkirinê ye. Ev terîqeta hanê bi awayekî misoger, girêdayî Qur'anê û Sunetên Hizretê Muhammed bûye, lewra, di navbera bisilmanan da bi awayekî berfireh belav bûye. Şahê Neqşebend vê terîqatê wiha pênase dike: "Rêya me, rêyeke were ye ku zor tê dîtin, xelekeke zexm e, armanc bi tenê destgirtina sunetên Resûlê Xwedê ye û şopandina rêya sehabiyên wî ye. Selat û selam li ser Resûlê Xwedê û sehabiyên wî be"⁽⁹⁾.

Ji serê sedsala XIXan vir da li herêma Kurdistan û di dewleta Osmaniyan da şaxa terîqeta Neqşebendiyan ya Xalidîtiyê her diçe berbelav dibe. Ev jî bi alîkariya Mewlana Xalidê Bexdadî Şehrezorî, bûye. Ew damezirînerê şaxa Xalidiyan e û di sala 1193/1779an da li Senceqa Şehrezorê li bajarokê Qeredaxê hatiye dinyayê. Di sala 1805an da diçe heca xwe dike û li wir eleqeyeke wî bi tesewufê ra çêdibe û bi vê wesîleyê diçe Hindistanê, bajarê Dilhê, cem Şêxê Neqşebendiyan; Şêx Ebdullah Dilhewî û dibe murîdê wî. Piştî vegeza ji Dilhê, tê bajarê Silêmaniyê û Bexdayê, karê îrşadê berdewam dike. Şehrezorî, di sala 1823yan da koç dike, diçe Şamê û karê xwe li wê derê berdewam dike û di sala 1827an da emrê Xwedê bi cih tîne û li ser girê Kasiyûnê, tê veşartin⁽¹⁰⁾.

Di derbareyî jiyana Şêx Muşerref da çawa li jor derbas dibe, ev ji bo ku ji xwe ra murşidekî bibîne, ji Sêrtê derdikeve û diçe Başûrê Kurdistanê, li gundekî bajarê Zaxoyê bi navê Berzûrî bi cî dibe. Ew di dema çûyîna xwe ya Zaxoyê da diçe Hewlêrê/Erbîlê û li wir Mustefa Kemaleddînê Erbîlî jî dibîne û wî ji nêz va nas dike.

Çawa li jorê jî derbas dibe Şêx Muşerref, îcazeta xwe ya ilmî ji Mela Ebdulhekîm, ji bavê xwe û ji hin alimên din girtiye û were jî îcazeta xwe ya terîqetê jî ji du kesan wergirtiye. Wî, cara ewil ji Şêx Mustefa Kemaleddînê Erbîlî, wî jî ji bavê xwe Şêx Ebabekir Xiyaseddîn, wî jî ji Şêx Osmanê Tiwîleyê û wî jî ji Mewlana Xalidê Şehrezorî wergirtiye. Xînûkî, cara duyem ji bavê xwe Es'edê Sanî îcazeta terîqetê wergirtiye, bavê wî jî îcazeta xwe ya terîqetê ji bavê xwe Şêx Ebdullah wergirtiye. Bavê wî jî bi rêya Baseretê digêhêje Mewlana Xalidê Neqşebendî⁽¹¹⁾.

Şêx, di dawiya temenê xwe da bi nexweşiya kezebnetêrêkirinê (penceşêra kezebê) dikeve û demekê di nexweşxaneya Sêrtê da radizê û tedawî dibe. Di wesiya xwe da dixwaze ku wî, di goristana Şêx Silêmanê ku têda Mela Xelîlê Sêrtê (1754-1843) metfûn e, were definkirin. Şêx Muşerref, di 83 saliya xwe da di 19ê Adara 2008an da emrê Xwedê bi cih tîne û di 20ê Adara 2008an da li Mizgefta Sukê ya Sêrtê Mela Bedreddîn Sancar limêja cenazeyê wî dike û bi girseyeke gelek mezin cenazeyî wî dibin û di goristana Şêx Silêman da, li nêzîkî gora Mela Xelîlê Sêrtî defindikin⁽¹²⁾.

Şêx Muşerref, jiyana xwe di xizmeta dînê xwe û miletê xwe da borandiye û bi sedan feqî dane xwendin û li pey xwe bi dehan berhem hiştine. Şêx Muşerref, mirovekî zana, ronakbîr, edîp, muderis, şêxê terîqetê, piştî bavê xwe mezinê malbata xwe û gundê xwe, aqilmend û rihspiyê herêma Berwarî û Sêrtê bûye. Ew; mirovekî bi edeb, ciwanmerd, dilnizm û nefspîçûk, dilsoz û sozdar bûye. Wî gelek zêde ji ilm û zanistiyê hez kiriye. Bo nimûne di vê malike da di derheqê zanistiyê da evha dibêje:

Ferqa însanî ji heywanî xwendin û edeb

Mirovê xwenda şîrîn e çî 'ecem bî çî 'ereb (YM: 6)

Şêx Muşerref, kêfxweş û rûgeş bûye. Mirov dema berê xwe dide helbestên wî vê yekê bi awayekî zelal dibîne. Weke mînak:

Tû gihan e sêv xuyan e vê bizane ey lebîb

Derdê zik derdek giran e pir gerîb û pir 'ecîb (YM: 4)

Şêx Muşerrefê Xînûkî, di malikekî dinda jî evha dibêje:

Dilê min çayekê mehbûb û taze

Li ser kehniya rezan îşev dixwaze (YM: 7)

Şêx Muşerref, rewşenbîrekî pîralî bûye. Wî li gel zimanê Kurdî; zimanê Erebî, Farisî û Tirkî jî zanibûye. Lewra wî bi çar zimanan helbest nivîsandine û agahiya wî ji edebiyata klasîk baş hebûye. Dema mirov li dîwana wî ya çarzimanî dinihêre, bi awayekî aşkere vê yekê dibîne.

2. BERHEMÊN ŞÊX MUŞERREFÊ XINÛKÎ

Şêx Muşerref, ji warê siyasî va di demeke dijwar da ji dayîk dibe. Lewra Komara Cumhûriyeta Tirkîyeyê, nû hatiye damezrandin û gujiguj û qîjiqîqa bayê nijadperestiyê di temamê welêt da deng vedide. Rêvebirên Cumhûriyetê, ew kesên ku di komarê da jiyana xwe berdewam dikin, giştikan weke Tirk dihesibînin û dibêjin ev welatê hanê bi tenê welatê Tirkan e. Çawa wezîrê perwerdehiyê Mahmut Esat Bozkurt (1892-1943) dibêje *“Ew kesên ku dibêjin em ne Tirk in mafê wan tenê koletî ye.”*⁽¹³⁾ Zimanê Kurdî tê qedexekirin, ew kesên ku bi zimanê dayîka xwe qise dikin û dinivîsin,

têne cezakirin û wan dikine heps û zîndan. Her weha medrese têne girtin û xwendina dînî jî tê qedexekirin.

Di nav ev şert û mercên dijwar da Şêx Muşerref, hinek caran bi dizî, hinek caran jî bi aşkere berhemên xwe nivîsandine. Xinûkî, zimanê Kurdî, Erebi û Farisî bi awayekî baş zanîbûye û bi van zimanan berhem dane. Şêx, bi zimanê Tirkî jî zanîbûye, lê çawa Îhsan Sureyya Sirma jî dibêje wî zêde bi Tirkî qise nekiriye; ango baş nizanîbûye⁽¹⁴⁾. Dema kesên tenê bi zimanê Tirkî zanîbûne û hatine ziyareta Xinûkî, wî bi Kurdî qise kiriye û yê devdora wî jî wergerandine Tirkî. Kurê wî Abdullah Ozcan dibêje: “Tirkiya bavê min pir hindik bû û axaftina wî bi zimanê Tirkî, ji wî ra gelek zehmet bû.”

2.1. Dîwan

Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî, pîrzimanî ye. Di dîwanê da ji 200î zêdetir bi ‘Erebî, 78 helbest bi Kurdî, 10 helbest bi Farisî û helbestek jî bi Tirkî ye. Helbestên bi ‘Erebî di dawiya dîwanê da ne, yê Kurdî, Farisî û Tirkî jî di serê dîwanê da ne û tevlihev in. Dîwana Şêx Muşerref, dîwaneke murettib nîne; yanê li gorî rêza qafiyeyê nehatiye nivîsandin.

Ji bo ku mijara me bi tenê li ser helbestên Xinûkî yê bi Kurdî ne, me agahî bi tenê di derbareyê helbestên wî yê Kurdî da dane. Şêx Muşerref, helbestên xwe li gorî elifbêya Erebi bi temamê herfan nenivîsandine û bi sêzdeh (13) herfên Erebi û bi herfeke (1) Kurdî (ئ/ê) nivîsandine û hejmara helbestên ku bi herfa Kurdî hatine nivîsandin jî şeş (6) in. Me di tabloya jêrê da helbestên Kurdî ji aliyê herfa qafiyeyê, ji aliyê hejmara helbestên ku bi heman qafiyeyê hatine nivîsandin û ji aliyê hejmara wan va dane.

Şêx Muşerrefê Xinûkî, helbestên xwe yê Kurdî bi şeş (6) cureyan nivîsandine. Helbestên ku di dîwanê da cih girtine ne bi nîzamî ne, tevlihev in. Cureyên helbestan bi vî şiklî cih digirin: 27 qesîde, 11 xezel, 15 mesnewî, 17 murebbe’, 1 muxemmes û 7 yekmalik in.

Dîwana Şêx Muşerref, li gorî nusxeya ku me ji xwe ra weke bingeş girtiye ji 228 wereqeyan pêk tê û bi çar zimana ye. Têda helbestên Kurdî, Farisî, Erebi û Tirkî hene. Di dîwanê da ji 200î zêdetir helbestên Erebi, 78 helbest Kurdî, 10 helbest Farisî û helbestek jî bi Tirkî ye. Gelek helbestên wî jî wenda bûne û hetanî vê gavê nehatiye dîtin.

Cureyên helbestan; qesîde, xezel, murebbe’, muxemmes û mufred in. Ev berhema mijara me ye û em ê bi hûngilî li serê bisekinin. Destxeta vê berhemê li cem malbata Şêx Muşerrefê Xinûkî ye.

2.2. Kitêba Hacı Ehmedî

Berhem, bi zimanê Kurdî ye, bi destxeta nivîskarî hatiye nivîsandin û ji 105 wereqeyan pêk tê. Şêx, di vê berhemê da qala şêxên terîqeta xwe dike û ya herî muhim ev e ku Şêx Muşerref, kesê yekem e ku silsileyê şêxên terîqeta xwe bi Kurdiya zaravayê Kurmancî nivîsandiye. Lewra hetanî vê gavê nehatiye tesbîtkirin ku di nava şêxên Kurdan da kesekî silsileyê şêxên terîqeta xwe bi Kurdî nivîsandiye, yan bi Erebi yan jî bi Farisî nivîsandine.

Şêx, di vê berhemê da çend bîranîn û zanînên xwe di derheqê bavê xwe û birayê xwe Şêx Munewwer da tîne zimên. Destxeta vê berhemê li cem malbata Şêx Muşerrefê Xînûkî ye.

2.3. Kitêba Mela Eledînî

Ev berhema hanê weke nameyekê ye, ji 117 wereqeyan pêk tê û destnivîsa Şêxî bixwe ye. Naveroka berhemê li ser îtiqad û eqîdeyê ye. Şêx, di berhêmê da, ji bona ehl û merivên xwe û peyrewê xwe Mela Eledînî, bi awayekî şîretî/dîdaktîk nivîsandiye. Destxeta vê berhemê li cem malbata Şêx Muşerrefê Xînûkî ye.

2.4. Tehiyyetu'l-Etfal

Berhem, bi awayekî menzûm hatiye nivîsandin û ji 64 beytan pêk tê. Berhem, bi eslê xwe zanîn mijara zurûfê, li ser Nehwê ye. Şêx, ji bo ku feqî vê kitêbê bi awayekî hêsan ji bere bikin, ev mijar bi têşeya nezmê nivîsandiye. Destxeta vê berhemê li cem malbata Şêx Muşerrefê Xînûkî ye.

2.5. Şerha Luccetu'l-Esrarê

Berhem, bi eslê xwe berhema Mawlana Camî ye û bi zimanê Farisî ye. Şêx Muşerref şerha berhemê çêkirîye. Şêx, şerha xwe bi awayê kevneşopîya klasîk nivîsandiye, yanê, li binê her beytekê şerha wê bi Erebî nivîsandiye. Destxeta vê berhemê li cem malbata Şêx Muşerrefê Xînûkî ye.

2.6. Mektûbat

Ev berhem bi tevahî ji nameyan pêk tê û destnivîs ji 217 wereqeyan pêk tê. Şêx, ev name ji bona dost û hevalên xwe nivîsandine. Destxeta vê berhemê li cem malbata Şêx Muşerrefê Xînûkî ye.

2.7. Eyyuhe'l-Weled

Şêx Muşerref, ev berhem ji bo kurê xwe Muhemmed Wefa nivîsandiye. Naveroka vê berhemê şîret in.

3. KESAYETIYA EDEBÎ YA ŞÊX MUŞERREFÊ XINÛKÎ

Şêx Muşerref, di gelek medreseyan herêmê da xwendîye û ji gelek alim û zanayan herêmê ders girtiye. Wî, him di warê ilmê îlahiyatê da û him jî di warê ilmê edebiyatê da cihekî gelek girîng girtiye. Gelek alim û zana li ber çoka wî rûniştine, xwendine û wî gelek berhem li dûv xwe hiştine. Berhemên wî bi piranî bi Erebî ne û ji wana çend heb jî bi Kurdî ne. Berhemên wî hinek bi têşeya nesrê û hinek jî bi têşeya nezmê hatine rastin.

Şêx Muşerref, ehlê tesewufê ye û peyrewê Mawlana Xalidê Şehrezorî ye. Ji aliyê zimanî va wî zimanekî xwerû û zelal bi kar anîye. Mirov, berhemên wî bi awayekî hêsan fêm dike.

Kesayeta Şêx Muşerrefê Xînûkî ya edebî, bêguman bi dîwana wî ya çarzimanî da derdikeve holê. Mirov, dikare Dîwana Şêx Muşerrefê Xînûkî ji hinek alîyan va girîngtirîn diwanên edebiyata Kurdî ya Kurmancî bihesibîne. Lewra dîwan, bi çar zimanan hatiye nivîsandin. Ev yeka hanê ji bo edebiyata Kurdî da tiştekî gelek muhim

e. Ji alîyê cureyên helbestan va yên ku di dîwanê da bi zaravayê Kurmancî cih girtine jî ji mesnewî, xezel, qesîde, murebbe', muxemmes û yekmalikan pêk tên. Bi rastî bi vî rengî dîwanên ku bi zaravayê Kurmancî hatine nivîsandin zêde nînin. Naveroka helbestan bi piranî ne't, munaceat û nisîhetin. Nusxeya dîwanê ya eslî di destê me da tune ye; yanê destxeta helbestvanî wendaye. Lê belê du nusxeyên dîwanê hene û herdu nusxe jî di bin qontrola muellîf ra derbas bûne. Ev agahiya hanê ji bo lêkolîneran gelek muhim e. Şêx Muşerrefê Xînûkî, dema helbestên xwe nivîsandine, li derkenarên wan da di derheqê helbestên xwe da hinek agahî dane. Ev agahî ji bo têgihîştina helbestan karekî gelek girîng e. Weke mînak; di serê hinek helbestan da ew helbest jî bo kê nivîsandibe di derkenarê wereqeyê da agahî dane. Bi vê rê û rêbazê em têdigêhîjin ku ev helbest jî bo filankesî-bêvankesî hatiye nivîsandinê.

3.1. Zimanê Wî

Şêx Muşerrefê Xînûkî, di helbestên xwe da zimanekî sivik û zelal bi kar aniye. Mirov, dema berê xwe dide helbestên wî, dibîne ku him peyvên gel him jî peyvên edebiyata klasîk cih girtine. Ev jî dide xuyakirin ku agahiya Şêx, him ji çanda gel heye him jî ji edebiyata klasîk heye.

Xînûkî, ji bo ku ehlê medreseyê ye, ew jî weke alim û zanayên medreseyê di warê zimanî da şareza bûye. Lewra, wî di dîwana xwe da bi çar zimanan; yanê bi zimanê Kurdî, Erebi, Farsî û Tirkî helbest nivîsandine. Mirov, dema li helbestên wî dinihêre bi awayekî aşkere dibîne ku di bikaranîna zimanê Kurdî, Erebi û Farsî da gelek serkeftî ye, lê di zimanê Tirkî da ewqas serkeftî nîne. Ji bo ku Şêx Muşerref, perwerdehî di medreseyê da dîtiye, têda ders daye û zimanê pirtûkên dersê jî piranî bi Erebi û Farsî bûne, zimanê wî di bin bandora Erebi û Farsî da maye. Di dîwanê da jî 200î zêdetir helbest bi Erebi ne û pirê wan jî ji qesîdeyan, xezelan, murebbe'an, muxemmesan û yekmalikan pêk tên û bi qasî 10 helbestên wî jî bi Farsî ne. Ev agahiya hanê jî dide xuyakirin ku Şêx, zêde zêde di bin tesîra Erebi û Farsî da maye.

Di helbestên Kurdî da unsûrên Erebi û Farsî hin caran weke beytekê, weke risteyekê, hin caran jî weke nav, sifet û terkîban derdikevine pêşberî me. Zimanê Şêx Muşerrefê Xînûkî, di helbestên Kurdî da zêde zêde bi peyv û têgehên Erebi hatine xemilandin.

Di helbestên Şêx Muşerref da unsûrên Erebi û Farsî jibêje, têgeh, biwêj û îqtibasên ji ayêt û hedîsan û ji hinek telmîhên ji bûyerên dîrokî pêk tên. Digel vê yekê di helbestan da hinek caran mulemme'ên ku risteyeke wan bi Kurdî ya din bi Erebi û Farsî, yan jî du riste bi Kurdî û yên din jî hinek caran bi Erebi û hinek caran jî bi Farsî hatine bilêvkirin hene. Ev tesîra unsûrên Erebi û Farsî û îqtibasên ji ayêt û hedîsan taybetiyeke Xînûkî nîne, kevneşopiyeyeke edebiyata klasîkê ye. Lewra, Şêx Muşerref jî ev kevneşopîya hanê şopandiye. Lê hewceyê gotinê ye ku mirov, bibêje Şêx Muşerrefê Xînûkî, di bikaranîna zimanê Kurdî da serkeftî ye û ziman baş emilandiye. Eger mirov jî bona helbestên wî yên Kurdî rêjeyekê dayne, bi awayekî hêsan dikare bibêje di helbestan da tesîra Erebi û Farsî ji sedî bîst û pêncan zêdetir nîne.

3.1.1. Tesîra Devoka Botan û Hekariyê

Zimanê Şêx Muşerref, zimanekî servekirî û zelal e. Her çiqasî zimanekî klasîk bi kar anîbe jî peyvên ku di helbestên xwe da emilandiye, wateya wan hêsan e. Yanê weke zimanê Melayê Cizîrî giran nîne.

Mirov dema helbestên wî di ber çavan ra derbas dike, çawa li jêrê derbas dibe dibîne ku bandora devoka Botan û Hekariyê bi awayekî aşkere xwe nîşan dide.

Di devoka Botan û Hekariyê da herfa “t” yê dikeve dawîya lêkeran. Weke nimûne: bibit, dibit, nabit, diket, naket, divêt, bivêt, navêt û hwd. Di van malikên jêrê da ew lêkerên ku hatine bikaranîn herfa “t” yê hatiye dawîya wan.

Ji vê fikrê me dil daim dibit hey
Nehin têda birin û dağ û hem key (MS: 6/15)

Ji bo te afixet bit ew şeraba
Vexarî te eya dostê Girafê (X: 10/3)

Wê dema dî weqtê mirnê rû li ser axê nihî
Ey birader ferqê **naket** Sanîhî bî ya Nûhî (YM: 1)

Di devoka Botan û Hekariyê da peyva “şol” bi wateya hal, hereket rewş, fî’l û ‘emel tê bikaranîn. Şêx Muşerref, di malika jêrê da peyva “şol” di wateya fî’l û ‘emel da bi kar aniye.

Xweda mebrûr biket hecca te çêket
Hemî **şolê** te ey dostê Girafê (X: 10/2)

Di devoka Botan û Hekariyê da navê “Xwedê/Xweda” bi formata Xudê/Xuda hatiye emilandin. Çawa di malikên jêrê da jî tê xuyakirin, Xînûkî jî navê “Xwedê/Xweda” bi formata Xudê/Xuda bi kar aniye.

Hemdê bê hed bo **Xuda** yê bê zewal û bê fena
Malikê her nî’metan û mu’îyê her qenciyan (Q: 25/11)

Ey **Xuda** ya dil bişîne ya me jî waşil bike
Min ji bo hicran nîne taqeta hilgirtinê (Q: 8/11)

Ya babê Îzzeddîn, **Xuda**
Zanî ji te nabim cuda

Ne li ser xetan ne li bin xetan
Bê te tu ca naşebirim (M: 15/9)

Di devoka Botan û Hekariyê da bi taybetî peyva “digel” û “nik” tê bikaranîn. Mirov dema li helbestên Şêx Muşerref mêze dike, gelek caran peyva “digel” û “nik” hatiye bikaranîn. Bo nimûne:

Cumle sadatê li ho destê ewan maçu dikem
Hem selaman rêdikem her ez **digel** baê nesîm (Q: 10/10)

Ey Muşerref bes bibêj yeksane lew kurt û dirêj
Yê ku zana bî li **nik** wî wek yekin lew tişt û teşt (X: 1/5)

Di devoka Botan û Hekariyê da qertafên weke “key, dey, ey” têne dawiya lêkeran. Xînkî jî ev qertafana zêde zêde emilandine. Weke nimûne:

Ji vê fikrê me dil daim dibit hey
Nehin têda birin û dağ û hem **key** (M: 6/15)

Kehniya sipî çemek feqyan û newala xwey cemed
Deşt û hem çîrnê tennûr qeb qeb dikin em her em in (Q: 19/19)

3.1.2. Unsûrên Erebi

Şêx Muşerref, seydayê medreseyan e û bi dehan salan di medreseyan da darsa feqîyan daye û bi awayekî aşkere tê xuyakirin ku ew, pîsporê zimanê Erebi ye. Mirov, dema dîwana wî dide pêşiya xwe û lê dinêre, dibîne ku Şêx, gelek di bin tesîra zimanê Erebi da maye. Sedema herî mezin jî ew e ku dema Kurd, dîne Îslamê qebûl dikin û dibin bisilman, zimanê wan jî dikeve bin bandora zimanê Ereban. Lewra Quran bi zimanê Ereban hatiye nazilîkirin û Hezretî Pêxember jî Erebi e.

Ji aliyê din va di nava Kurdan da zimanê Kurdî, bi awayekî fermî nebûye zimanê perwerdehiyê. Her çiqasî di medreseyan da şîroveya dersan bi zimanê Kurdî be jî kitêbên dersan çar-pênc heb netêda, bi tevahî bi Erebi ne. Vê yekê jî tesîreke gelek mezin li ser feqî û seydayên wan kiriye.

Ji bo ku Şêx Muşerref jî kesekî ji ehlê medreseyê ye, ev tesîra hanê zêde zêde li ser wî jî çêbûye. Di edebiyata klasîk da ev tesîra hanê bandoreke hevpar e; yanê li ser hemû helbestvan û edebiyatnasên klasîk kiriye. Lê hewceye were gotin ku helbestvan û edebiyatnasên Kurdan, dema peyvên Erebi bi kar anîne, bi piranî ew rasterast negirtine; yanê dema peyvên Erebi bikar anîne, berê xistina formata zimanê Kurdî, paşê jî di hevok û helbestên xwe da bikaranîne. Em ê nimûneyan li jêrê bidin.

Hinek nimûne ji peyvên Erebi yên ku Şêx Muşerref di helbestên xwe yên Kurdî da bi kar anîne.

Erebî	Kurdiya Wê	Erebî	Kurdiya Wê
Şehîh	Durust	Durr	Încî
Tekellum	Axaftin	Teellum	Pê êşandin
Lîqa	Hevûdin dîtin	Welakîn	Lê belê

Fîlheqîqet	Bi rastî	Lasiyyema	Bi taybetî
Ewraq û eşcar	Pel û dar	Fîraq	Cudayî
Îhtîraq	Şewitandin	Weşlet	Gîhandina hevûdin

Hinek nimûne ji ravekên Erebi yên ku Şêx Muşerref di helbestên xwe yên Kurdî da bi kar anîne.

Erebî

Nef'e tekellûm
Mehellê 'ewn û hem neşrê
Serrafê qulûban
Deffa'ê kurûban
Narê cehîm

Kurdiya Wê

Fayde ye axaftin
Cihê alîkarî û serkeftinê
Pisporê dilan
Tunekirinê derdan
Agirê dojhê

Hinek nimûne ji malikên Erebi ku di nava helbestan da derbas dibin:

Leke'l-hemdu îlahî we'-ş-selatu

'Ela zâtî lehu kemulet şifatu (MS:6/20)

We şelle'l-lahu 'ela xeyrî'l-beraya

Fe mîn enwarîhî qed ðae 'urfe (Q:18/13)

We alî şumme eşhabu'l-mezaya

We men mîn hîzbîhî qed cae 'urfe (Q:18/14)

Îlahî qed teheyyertu we 'en geyrîke rece'tu

Bîke emrî tefewweðtu fe xuz **mîm** ma me'elfaî (X:6/9)

Eberre'n-nase fî'l-qewlî

We muncîhîm lede'l-hewlî

We îh tes'el 'enî'l-fedlî

Fe haza leyletu'l-qedrî (M:9/3)

Yunacî'l-lahe fî'l-ğeybî

We ma fî zake mîn reybi

Se'a 'edwen île'-ş-şîbî

Lî xewfî'l-lahî we'z-ze'rî (M:9/7)

Şêx Muşerrefêb Xinûkî, di bikaranîna terza mulemmê'ê da xwe weke pisporek nîşan dide. Hinek caran risteya Erebi, di dawiya malikê da, hinek caran di navenda malikê da, hinek caran di serê malikê da û hinek caran jî di herdu risteyên dawiyê da bikar tîne. Ev yeka hanê di nimûneyên jêr da bi awayekî zelal têne xuyakirin.

Mîne'l-lahî, île'l-lahî; me'e'l-lahî, we fî'l-lahî

Feya lî'l-lahî mîn ze'l-halî ya reb çî lezzet bû

(Q:27/10)

Ya Eba Selman Suleyman ey bira û ey çira

Bo çî mektûban birê nakî ji bo dostan çira

Hel tera innî erakum qeble mewtî hel tera

Yan evan derd û geman dê bibne qebrê bi xwe ra

Ah ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê

(MX:1/4)

Eya Şêxê 'îraqî min tu yî ruh

Tu yî ruh û rewan Şêxê 'îraqî

Îleykum eştekî we'l-qelbu mecrûh

Bînarî'l-hubbî bu'dî we'f-tîraqî

(M:4 /11)

Qelbê ehlê dilan û çeyera ehlê dinî

Quwweta wî ji şehînşahê resûlê medenî

Ruhniya qelb û ciger sanî'ê burdê yemenî

Înnehu'l-quṭbu bîhî'r-rîbḥu fe mînhu'îxtenem

(M:6/2)

Weke li jorê jî derbasbû, di helbestên Xînûkî yê Kurdî da, unsûrên Erebi gelek zêde ne. Bo nimûne, me li jêrê çend mînak ji bo terkîb û hevokên Erebi û Kurdiya wan jî li hember wan dan.

Terkîb û Hevokên Erebi

Derd û gem û huzn û cefa

Def'a gem û huzn û teellum (MS:6/9)

Keza al we eşhab cemî'en (MS:6/21)

Ehlen we sehlen (M:4/7)

Huwe 'Uşmanu mîne'l-hîlmî 'Eliyyu's-şiyem

(M:6/3)

Kurdiya Wan

Derd û xem û xemgînî û êş

Defkirina xem û xemgînî û pê êşandin

Keza malbat û hevalên wî bi tevahî

Bî xêr û xweşî hatî

Ew Osman e xûyê rûnermiyeke mezin e.

3.1.3. Unsûrên Farisî

Şêx Muşerref, di helbestên xwe da di bin tesîra zimanê Farisî da jî maye. Wî, peyvên Farisî bikar anîne, lê gelek hindik. Li jêrê jî hinek peyvên ku wî di helbestên xwe yê Kurdî da bi kar anîne, weke nimûne hatine nîşandan.

Peyva Farisî

Naşehîh

Nalezîz

Kurdiya Wê

Nedurust

Bêtahm

Peyva Farisî

Dibosim

Mewlayê ma

Kurdiya Wê

Paçî dikim

Mewlayê Me

Bûsedar	Ramûsanvan	Bîm	Tirs
Xer	Ker	Xûb	Xweşik
Destê ma	Destê me	Nemî ayed	Nayê

3.1.4. Mexlesa Wî

Di edebiyata klasîk da weke kevneşopiyekê, helbestvan di helbestên xwe da gelek caran navên xwe yê rasteqînî bikar naînin, di dewsa navên xwe da ji xwe ra mexlesan bi kar tînin. Weke mînak; di edebiyata Kurdî da Melayê Cizîrî mexlesa “Nîşanî û Mela” zêdetir bi kar anîye û Feqîyê Teyran jî “Mîm Hê û Feqî” bikar anîye.

Em dema li dîwana Şêx Muşerref mêze dîkin, dibînin ku wî jî ev kevneşopîya edebiyata klasîk bikar anîye û di helbestên xwe yê Kurdî da ji xwe ra mexlesa “Mîm Fa” û hinek caran jî mexlesa “Muşerref” bi kar anîye. Weke nimûne:

Îlahî bike meskenê **Mîm Fa**

Ewî bagê pir lezzet û hem şefa (MS: 2/26)

Ya îlahî **mîm** û **fa** ye

Yê ji xelqê bêrica ye

Heviya zatê te maye

Pê ve ez hêviya hebîbim (M: 5/6)

Ey **Muşerref** bes bibêj yeksane lew kurt û dirêj

Yê ku zana bî li nik wî weke yekin lew tişt û teşt (X: 1/5)

Ey **Muşerref** beske xaran were rahet rûne tu

Qore hespê te xelas nake ewê deşta ‘ezîm (Q: 10/4)

Di malikeke Erebi da jî Şêx Muşerref mexlesa “**mîm fa**” yê bikar tîne.

Îlahî qed teheyyertu we ‘en geyrîke recce‘tu

Bîke emrî tefewweđtu fe xuz **mîm** ma me‘el **faî** (X: 6/9)

3.1.5. Edîbên Ku Li Ser Tesîr Kirine

Şêx Muşerrefê Xînûkî, di helbestên xwe da herî zêde di bin tesîra Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Melayê Bateyî, Mela Xelîlê Sêrtî û Seyîd Elî Findikî da maye û ji wan sûd wergirtiye. Li jêrê em dê li ser wan helbestvanên ku li ser Şêx Muşerrefê Xînûkî bûne xwedî bandor, bisekinin.

3.1.5.1. Melayê Cizîrî

Bandora Melayê Cizîrî him ji aliyê ziman va him jî ji aliyê naverokê va li ser Şêx Muşerref gelek zêde çêbûye. Weke mînak, helbesta Şêx Muşerrefya bi navê “Derdê Bêderman Fîraq e” dişibihe helbesta Melayê Cizîrî ya bi navê “Bi Narê Fîrquetê Şohtim”. Ji aliyê naverokê va zêde di bin bandora helbesta Cizîrî da maye, lê ji aliyê lefzî va riste newekhev in. Çarîna serî û ya dawiyê ya helbesta Cizîrî û ya Xinûkî evha ne:
Helbesta Melayê Cizîrî ya bi navê “Narê Fîrquetê Şohtim” benda serî û ya dawiyê.

Bi narê fîrquetê şoht im
Ji ferqê heta ser pê da
Xedenga xefletê nûht in
Ji berqa lami’a tê da⁽¹⁵⁾

Mela bêqameta yekta
Qiyamet min çehvan dî
Fîrquetê rûsiyan bin te
Ji min canê şîrîn cê da⁽¹⁶⁾

Helbesta Şêx Muşerrefê Xinûkî ya bi navê “Derdê Bêderman Fîraq e” benda serî û ya dawiyê.

Derdê bêderman fîraq e
Ew bi mişlê îhtîraq e
Ew didit xelqê filaq e
Rahetî vê ra fena ye (M:1/1)

Her kesê dîtî bi şewket
Ew dizanî ew we naket
Heta ser tilyan bi zer ket
Yek ji wan jî **mim fa** ye (M:1/10)

3.1.5.2. Ehmedê Xanî

Şêx Muşerrefê Xinûkî gelek zêde di bin tesîra Ehmedê Xanî da maye û hinek caran jî rasterast bi helbesta Xanî dest bi helbestên xwe kiriye. Weke nimûne di xezela xwe ya bi navê “Di Fesla Nûbiharê” da bi vê malika ku di Nûbihara Piçûkan da derbas dibe destpê dike:

Di fesla nûbiharê da digel dîlber biçim geştê
Ji ew xweştir ‘umur nayê li min hal qewî xweş tê⁽¹⁷⁾ (X:9/1)

Şêx Muşerrefê Xinûkî, bi taybetî di bin bandora berhema Ehmedê Xanî ya bi navê “Nûbihara Piçûkan” da maye. Ehmedê Xanî di berhema xwe da di serê her beşê da weke şîretê, gotinek gotiye. Xinûkî jî di serê helbestên xwe yên Kurdî da bi navê

“Gûz û Miwîj” beşek nivîsandiye û têda şîretan li xwendekaran dike. Dema mirov vê beşê dixwîne, dibêje her wekî ku ez Nûbihara Piçûkan dixwînim:
 Di serê beşa yekem da Ehmedê Xanî evha dibêje:
 Heta tu dewr û dersan nekî tekrar û mesrûf
 Di dinyayê tu nabî ne meşhûr û ne me’rûf⁽¹⁸⁾
 Şêx Muşerrefê Xînûkî di serê beşa “Gûz û Miwîj” an da evha dibêje:

Bixûnin hûn nekin teqşîr û sistî
 Emanet se’î û teşîl û durustî (MS: 1-1/1)

Bixûnin hûn di havîn û zivistan
 Nebî çêbî ji we yek roj û westan (MS: 1-1/3)

Bi dîqqet hûn bikin daim mîtal e
 Muţale malekî qet bêzewal e (MS: 1-1/5)

Melayê Bateyî

Melayê Bateyî, helbesta xwe ya bi navê “Ya Îlahî Ez Xerîbim” li ser xerîbî û xurbetiyê nivîsandiye û her weha Şêx Muşerref jî bi rengê Melayê Bateyî û bi heman navê, helbestek nivîsandiye.

Ya îlahî ez gerîbim
 Daima her dilkebîb im
 Bêhebîb û bêtebîbim
 Mam dinav qewmê xerîb⁽¹⁹⁾

Şêx Muşerrefê Xînûkî jî di qesîdeya xwe ya bi navê “Ya Îlahî Ez Xerîbim” da evha dibêje:

Ya îlahî ez gerîbim
 Bênewa me bêdelîl im
 Ya îlahî ez ‘elîlim
 Bêdewa me bêtebîbim (M:9/10)

Hemdê bêhed bo Xudayê ‘alemîn
 Ew Xudayê daye me dînê mubîn⁽²⁰⁾

Şêx Muşerrefê Xînûkî jî di qesîdeya xwe ya bi navê “Ey Muzeffer Ey ‘Ezîz Ey Çîçeka ‘Ebbasiyan” da evha dibêje:

Hemdê bê hed bo Xudayê bêzewal û bêfena
 Malikê her nî‘metan û mu‘tîyê her qenciyan (Q:25/11)

3.1.5.3. Seyîd Eliyê Findikî

Şêx Muşerref li ser şêxê terîqeta xwe bi navê “Gelek Îro Birîndarim” û “Gelî Berwariyan Beskin” du helbest nivîsandine û Seyîd Eliyê Findikî jî bi navê “Meded Seyda Meded Seyda” helbestek nivîsandiye. Li xwarê, me jî helbesta Findikî û Xinûkî çarîna yekemîn daye. Findikî evha dibêje:

Meded Seyda meded Seyda
Mi etrafê dinê tek da
Yekî wek te nebû peyda
Meded Seyda meded Seyda⁽²¹⁾

Helbesta Şêx Muşerrefê Xinûkî ya bi navê “Gelek Îro Birîndarim” jî evha destpê dike:

Gelek îro birîndarim
Medet ya Şahê Erbilê
Gelek îro gunehkarim
Medet ya şahê Erbilê (M:3/1)

Helbesta Şêx Muşerrefê Xinûkî ya bi navê “Gelî Berwariyan Beskin” jî evha destpê dike:

Gelî Berwariyan beskin
Bikin tewbê ji îsyanan
Bi hawar û ji dil bêjin
Meded şêx Es'edê Sanî (M:10/1)

4. MÎNAK JI HELBESTÊNŞÊX MUŞERREFÊ XINÛKÎ

Kitêba Gûz û Miwîj

Mefa'îlunMefa'îlunFe'ûlun

1.
Gelî feqyan gelî feqyan nezer kin
Heçî bêjim bizanin hem jiber kin
- 2
Çikû ez bo we tehqîqa evînim
Muhîbbek şadiqim hem gemrevînim
- 3
Kalamê min xweş û pir nazdar e
Şirîn e taze ye wek nûbihar e
- 4
Ji bo qeţ'a xerabî şîrê tîj e
Wekî navê xwe ye gûz û miwîj e

Fesla Tehşîlê

Mefa'îlunMefa'îlunFe'ûlun

1

Bixûnin hûn nekin teqşîr û sistî
Emanet se'î û tehşîl û durustî

2

Durustî lefzekî kurt û dirêj e
Kesê ku ew durust nabî qirêj e

3

Bixûnin hûn di havîn û zivistan
Nebî çêbî ji we yek roj û westan

4

Kesê xwenda muheqqeq her emîr e
Nexwenda her wekî pîvaz û sîr e

5

Bi dîqqet hûn bikin daim mîtal e
Muţale malekî qet bêzewal e

6

Ji metnan qet nebî lefzek jibîr kin
Xwe destvala û bêmal û feqîr kin

7

Nivîsandin qe nahêlî ku xwenda
Ji 'ilmê xwe biket yek lefzê winda

8

Ji 'ilm ra qelem la şekke nîv e
Ji bona her kesê xeţ zêr û zîv e

Feşla Qedrê Seyda

Mefa'îlunMefa'îlunFe'ûlun

1

Ji bo seyda muheqqeq ferz e îkram
Kesê ku nake îkram naxwe îna'm

2

Ji seyda ger dixwazî îstifade
Divêtin tu bikî bo înqiyade

3

Ji seyda ra kesê nakit îta'e
Qe nabînî di dinya intifa'e

4

Eger jê ra muţî' nabî bizane
Ku seydayê te ew nefsa nezane

5

Ji bo wî zahir û baţîn evîn be
Kesê ku ew nevê jê ra nevîn be

- 6
Îmamê me Elî dêjî efendim
Li her erdê ji bo ustadî 'ebdim
- 7
Yekî got Ey Sikender bo çi daim
Dikî teqdim li ser babê xwe 'alim
- 8
Cewab da faida bab fena ye
Welakin faida 'alim beqa ye

Fesla Mu'ameleta Hevalan
Mefa'îlunMefa'îlunFe'ûlun

- 1
Bihev ra xweş biborînin bi şahî
Bixûnin hûn bi meqşûda îlahî
- 2
Bihurmet bin ji bona hev dewamî
Hemî pêk ra ji hev ra kin gulamî
- 3
Emanet sed emanet sed emanet
Ji bona hev bikin daim şîyanet
- 4
Xuşûşen yê ku lefzek zêde xwendî
Hemî hev ra ji bo bêjin efendî
- 5
Hemî hûn eskerê xaşê îlahin
Gulam û xadimê wî barigahin
- 6
Eger ku hûn ji bona hev nebaş bin
Ji dergeh dê li paş bin bê me'aş bin
- 7
Nebî carek di dinyaê ku şer kin
Heta saqin fihêtkar û zerer kin
- 8
Nebêjin ratiba min zêde dûr e
Weya ev xizmeta hanê bîzor e
- 9
Nikarim ez hero hucrê bimalim
Li mala xwe 'ezîz û hem delalim
- 10
Kubarim min ji şalê xwe fihêt e
Binêre îşlikê min şubhê pê e

Feşla Exlaq

Mefa'îlunMefa'îlunFe'ûlun

- 1
Nebî çavê we daim bî li kevçik
Weya şalê heşîn û ya nepirçik
- 2
Cil û pirçik ji exlaqê jinan e
Biha nakit kesê metnê wî nan e
- 3
Ji bo feqîyan civat û hem 'elaiq
Di gel geyrî feqan qet nîne laiq
- 4
Di nava gund herin meşyek giranî
Li rast û çep nezer 'eyb e tu zanî
- 5
Muheqqeq pir kenîn û dengbilindî
Munafî ne ji bona 'eqilmendî
- 6
Cihan paqij bikin çendî bi karan
Di hucran qirş û qal wek 'eyb û 'aran

Gelî Feqyan

Mefa'îlunMefa'îlunFe'ûlun

- 1
Gelî feqyan gelî cem'a şîrînan
Bi wê derman dikim her dem birînan
- 2
Çira hûnin di dîwana evînan
Bi min mehbûbtirin ji mal û defînan
- 3
Bi we şahî dibit qelbê hezînan
Dikim gohrê we şîrînan û Zînan
- 4
Emanet metin û tekrar û mutale
Ji we ra ewlatirin ji hesp û mehînan
- 5
Bihev ra xweş biborînin bihev ra
Bixun qend û nebat û hingivînan
- 6
Welê çend rojekan hûn min 'efûkin
Nekin behsê ji **dal û ra û sînan**

Xatime

Mefa'îlunMefa'îlunFe'ûlun

1

Îlahî tu min û feqyan Îlahî
Himayet kî ji ef'alê menahî

2

Me şîrîn kî bi wan ewşafê şîrîn
Gelek muhtac û ne 'ilac û feqîrîn

3

Ji wî behra ku jê rihtî bi qencan
Bike îhsan ji bo me yek du fincan

4

Şelat û hem selam hingî hîrûfan
Li pêxember di gel şehib û mirovan

ENCAM:

Şêx Muşerrefê Xînûkî di serê sedsala XXan da hatiye dinyayê û di serê sedsala XXian da wefat kiriye. Xînûkî li pişt xwe gelek berhemên watedar hiştine û bi taybetî jî dîwana wî ya bi çar zimanî ji bo Edebiyata Kurdî ya Klasîk gelek muhim e, lê belê heta vê demê zêde nehatiye naskirin. Me xwest ku em li ser vê berhemê bixebitin û bala lêkolîner û xoşewîstên edebiyatê bikişînin serê. Di vê xebatê da em bi tenê li ser helbestên Şêx Muşerrefê Xînûkî yên Kurmancî sekinîne û me vekolaye. Di xebata xwe da me transkîrîpsiyona helbestan çêkiriye, ji aliyê ruxsarî û naverokê va tehlîla wan çêkiriye. Piştî vekolîna me ya li ser helbestên Xînûkî yên Kurdî em gihêştin van encamên jêrên:

1. Şêx Muşerref di sala 1926an da hatiye dinyayê û di sala 2008an da jî wefat kiriye. Seyda li pişt xwe gelek berhem hiştine, lê heta vê gavê berhemên wî bi awayekî rêkûpêk nehatine çapkirin û bi awayekî desxet di destê malbata wî da mane.
2. Xînûkî helbestên xwe bi tevahî di dîwaneke serbixwe da berhev nekiriye û desxetên xwe li cem xwe veneşartîye. Hinek helbestên wî ji aliyê heval û dostên wî va hatine berhevkirin. Hetanî vê gavê di destên me da du nusxeyên dîwanê hene û ev her du nusxe jî di bin qontrola muellîfî ra hatine derbaskirin. Gelek helbestên wî jî wînda bûne.
3. Dîwan bi çar zimanan, yanê bi Erebî, Farisî, Kurdî û Tirkî hatiye nivîsandine. Helbestên Kurdî bi tevahî 78 lib in û cureyên wan jî qesîde, mesnewî, xezel, murebbe', muxemmes û yekmalik in.
4. Naveroka helbestan bi piranî tesewuf, 'eşqa îlahî, nesîhetên di der bareyî exlaq û xwendinê da ne.
5. Seyda kevneşopîya edebiyata klasîk berdewam kiriye û di helbestên xwe da gelek "mezmûn" bi kar anîye.


6. Di nav helbestan da misra an jî malikên bi Erebi yan jî bi Farisî hene. Ev jî nîşan dide ku Şêx çawa di warê zimanê Kurdî da pispor e her wisa di zimanê Erebi û Farisî da jî pispor e.
7. Haya muellifî ji edebiyata Kurdî heye û Dîwana Melayê Cizîrî, helbestên Feqiyê Teyran, berhemên Ehmedê Xanî, Nehcu'l-Enama Mela Xelîlê Sêrtî û Dîwana Seyîd Elî Fındikî xwendiyê. Lewra mirov dema helbestên wî dixwîne û dinirxîne tesîra van şairên ku navên wan derbas bûn dibîne.
8. Xinûkî helbestên xwe bi kêşeya erûzê nivîsandiye û di bi kar anîna qalibên erûzê da serkeftî ye lê di hinek helbestan da jî di kêşa erûzê da tevlihevî heye.
9. Şêx Muşerref di warê wergerê da jî gelek serkeftî ye, lewra wî helbesteke Mewlana Xalidê Şehrezorî wergerandiye Kurdî. Mirov dema vê wergerê dixwîne qet bêhna wergerê jê nayê.
10. Di helbestên xwe da ji bo feqîyan gelek nesîhetan dike û dixwaze bi rêya helbestê wan teşwîqî xwendinê bike.

CAVKANÎ:


1. Adak, Abdurrahman, "Edîbê Mezin Şêx Muşerrefê Xunûkî Çû Rehma Xwedê", Nûbihar, h. 104, 2008.
2. Adnan, Demircan, İhsan Sureyya Sırma, Pervariden Parise, Weş. Beyan, İstanbul 2018.
3. Burhanettin Duran, Türk Parlemento Tarihi, TBMM-XIX. Dönem (1991-1995), TBMM Kültür Sanat Kurulu Yayınları, No: 15, (2012), I, 115.
4. Ebdulkerim Muhammed el-Muderrîs, Ulemauna fî xîzmetî'l-İlîm ve'd-dîn, (nşr. Muhammed Alî el-Qeredaxî, Bexdad 1983, Daru'l-Hurriye.
5. Ehmedê Xanî, Nûbar, (Berhevkar, Zeynelabîdîn Kaya), Weşanên Roja Nû, Stockholm 1986.
6. Ethem Cebecioğlu, Tasavvuf Terimleri ve Değişimleri Sözlüğü, Rehber Yayıncılık, Ankara 1997.
7. İbn Manzûr, Cemaluddîn Muhammed b. Mukerrem, Lîsanu'l-Arab, (nşr. Abdullah Alî Kebîr, Muhammed Ahmed Hesbullah, Haşîm Muhammed eş-Şazîlî), Daru'l-Mearîf, Qahîre, XV, 1360.
8. M. Halil Çiçek, Doğu Medreselerinin Serencamı, Beyan Yayınları, İstanbul, 2009, r. 15; Ziya Kazıcı, İslam Eğitim Tarihi, MÜİF Vakfı Yayınları, Çapa 4an, İstanbul 2016.
9. M. Halil Çiçek, Molla Halil b. Hüseyin b. Halid el-Ömerî", Uluslararası Siirt Sempozyumu, İzmir 2007.
10. M. Xalid Sadînî û Tehsîn Doskî, Şêx Muşerrefê Xinûkî û Şairên Malbata Wî, Çapxana Parêzgeha Dihokê, Çapa Êkê, Dihok 2013, r. 16-24.
11. M. Xalid Sadînî, Mela Huseynê Bateyî- (Jiyan, Berhem û Helbestên Wî), Weş. Nûbiharê, Çapa 3yan, İstanbul 2013.
12. Mela Ehmedê Zivingî, Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, (Amadekarî û Wergera ji Erebi: Emîn Narozi), Weş., Avesta, Çapa 1ê, 2013 İstanbul.
13. Melayê Bateyî, Mewlûd, , Amadekar Huseyn Şemrexî, Weş. Nûbiharê, Çapa 2yan, İstanbul 2012.
14. Nesim SÖNMEZ, Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî, Weşanên Weşanxaneyê Seyda, Ankara 2018.
15. Seyîd Elî Fındikî, Dîwana, Amadekar, Selman Dilovan-Huseyn Şemrexî, Çapa 7an, İstanbul 2014.

PÊVEK:


ÇEND NIMÛNE JI NUSXEYÊN DÎWANÊ




Nuxeya Mela Osmanî Rûpela Yekem




Nuxeya Mela Osmanî Rûpela Duyem




Nuxeya Mela Xidir Heşerî Rûpela Yekem



Nuxeya Mela Xidir Heşerî Rûpela Duyem



Nusxeya Mela Xidir Heşerî Rûpela Sisêyan



Nusxeya Mela Xidir Heşerî Rûpela Çarem

Perawêz:

- (1) Îbn Manzûr, Cemaluddîn Muhemmed b. Mukerrem, Lîsanu'l-Arab, (nşr. Abdullah Alî Kebîr, Muhemmed Ahmed Hesbullah, Haşîm Muhemmed eş-Şazîlî), Daru'l-Mearîf, Qahîre, XV, 1360.
- (2) M. Halil Çiçek, Doğu Medreselerinin Serencamı, Beyan Yayınları, İstanbul, 2009, r. 15; Ziya Kazıcı, İslam Eğitimi Tarihi, MÜİF Vakfı Yayınları, Çapa 4an, İstanbul 2016, r. 18.
- (3) Çiçek, "es-Si'irdî, Molla Halil b. Hüseyin b. Halid el-Ömerî", Uluslararası Siirt Sempozyumu, İzmir 2007, r. 372.
- (4) Çiçek, "es-Si'irdî, Molla Halil b. Hüseyin b. Halid el-Ömerî", r. 372-373.
- (5) M. Edîp Çağlayan, "Siirt ve Çevresindeki Medrese Eğitimi", Uluslararası Siirt Sempozyumu, İzmir 2007, r. 669.
- (6) Îbn Manzûr, XXVIII, r. 2527.
- (7) Ethem Cebecioğlu, Tasavvuf Terimleri ve Değişimleri Sözlüğü, Rehber Yayıncılık, Ankara 1997, r. 690.
- (8) Kavak, r. 2-3.
- (9) Kavak, r. 2-3.
- (10) Ebdulkerim Muhammed el-Muderrîs, Ulemauna fî xîzmetî'l-îlîm ve'd-dîn, (nşr. Muhammed Alî el-Qeredaxî, Bexdad 1983, Daru'l-Hurriye, r. 185-187.
- (11) M. Xalid Sadîni û Tehsîn Doskî, Şêx Muşerrefê Xînûkî û Şaîrên Malbata Wî, Çapxana Parêzgeha Dihokê, Çapa Êkê, Dihok 2013, r. 16-24; Adnan Demîrcan, Ihsan Sureyya Sırma, Pervariden Parîse, Weş. Beyan, İstanbul 2018, r. 59-61.
- (12) Adak Abdurrahman "Edîbê Mezin Şêx Muşerrefê Xunûkî Çû Rehma Xwedê", Nûbihar, h. 104, 2008. r. 27.

- (13) Burhanettin Duran, Türk Parlamento Tarihi, TBMM-XIX. Dönem (1991-1995), TBMM Kültür Sanat Kurulu Yayınları, No: 15, (2012), I, 115.
- (14) Adnan Demircan, İhsan Sureyya Sırma, Pervariden Parise, Weş. Beyan, İstanbul 2018, r. 26.
- (15) Mela Ehmedê Zivingî, Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, (Amadekarî û Wergera ji Erebi: Emîn Narozî), Weş., Avesta, Çapa 1ê, 2013 İstanbul, r. 123
- (16) Mela Ehmedê Zivingî, r. 139.
- (17) Ehmedê Xanî, Nûbar, (Berhevkar, Zeynelabîdîn Kaya), Weşanên Roja Nû, Stockholm 1986, r. 31
- (18) Ehmedê Xanî, r. 9.
- (19) M. Xalid Sadîni, Mela Huseynê Bateyî- (Jiyan, Berhem û Helbestên Wî), Weş. Nûbiharê, Çapa 3yan, İstanbul 2013, r. 68.
- (20) Melayê Bateyî, Mewlûd, , Amadekar Huseyn Şemrexî, Weş. Nûbiharê, Çapa 2yan, İstanbul 2012 r. 9.
- (21) Seyîd Elî Findikî, Dîwana, Amadekar, Selman Dilovan-Huseyn Şemrexî, Çapa 7an, İstanbul 2014, 83.

الشيخ مشرف الخنوكي وشخصيته الأدبية

الملخص:

ولد الشيخ مشرف الخنوكي في قرية (خونوك) التابعة لمدينة سکرد (سيرت)، درس القرآن الكريم والعلوم الشرعية في مدرسة والده، ثم شد الرحال إلى عدة مدارس أخرى حتى حصل على الإجازة العلمية، ثم انشغل بتعليم أبناء قريته، ثم هاجر قريته لأسباب سياسية إلى جنوب كُردستان وتحديداً إلى مدينة أربيل ثم استقر في قرية تابعة لقضاء زاخو. وقد افنى الشيخ خنوكي أغلب سنوات حياته في نشر العلم في كُردستان وتأليف الكتب باللغات الكُردية، والعربية، والفارسية، والتركية. تبحث هذه الدراسة في حياة هذه الشخصية الكردية ولا سيما ديوانه الشعري.

الكلمات الدالة: الشيخ مشرف الخنوكي، ديوان، سکرد، البرواري، المدرسة

SHEIK MUŞERREFÊ XINÛKÎ AND HIS LITERARY PERSONALITY

Abstract:

Sheik Muşerrefê Xinûkî was born in Xinuk, a village of Pervari in Siirt in 1926. He began his education by reading Qoran in his father's madrasa when he was a kid. Then he became a pupil in many madrasas and got his licence. After that he returned to his village and started to teach educate pupils so that they can be good mullahs for Islam doctrine and his nation. Because of some political reasons he went to Başûr and

stayed in Zaxo nearly for two years. Mean while he met Sheik Kemaledîn Erbîlî in Hewlêr and attended his religious path. After a short time he became his calif. Finally he was died in 2008.

His life was full of educative affairs and many religious and literary works were after him. Not only Kurdish, he knew some other languages very well such as Turkish, Arabic and Persian. When looking into his works, it is very possible to be able to see that he was full of love for his nation and native language. As he was sensitive about his mother language, he produced many of his works in Kurdish. His Dîwan is the most important of his works. He created his Dîwan in four languages- Kurdish, Arabic, Persian and Turkish.

Through this present we will introduce his literary personality with his life and works in a detailed way, especially evaluate about his Dîwan.

Keywords: *Şêx Muşerrefê Xînûkî, Dîwan, Siirt, Pervarî, Literature, Madrasa*